Derçûn ji desthelata manayê

Hoşeng Şêx Mihemed

Geryan li mirovî

Muhsin Qoçan

"Befra li vêrê" yekem berhema Muhsin Qoçanî ye ku wek pertûk çap kiriye, li sala 1986-ê hatiye çapkirin. Diyare di wî mawey de sereta ê bû ku di navbera yar û welatî de bigere û destpêkek bû ku mirov wek aşiq û meşuq wek yar, bihête naskirin.

Ji ber vê çendê jî dibînîn Muhsin Qoçanî ev pertûke kiriye diyarî bo (yara xwe welatê xwe). Diyare helbestên vê dîwanê, vala nînin ji binemayên siyasî û nîştimanî, lê dibînîn (sozdarî jî) di wan

helbestan de dibe binemayek bi hêz, aneku di vê derê de sozdarî, sozdariya mirovî bo mirovî, dibe binemayek nû di helbesta deverê de, renge ev çende berî Muhsin Qoçanî li cem helbestvanên dî jî hebe. Lê ne ku wek binemayek bi hêz, çendîn helbest di vî dîwanî de dişên bikine nimune bo vê sozdariyê û peywendiya nû beramber mirovî di helbesta deverê de, welat û yar, her dû pêk ve wek dû çemkên xwedan bihayên mirovayetî û nîştimanî verêja hizra Muhsin Qoçanîne di wî demî de û renge ez şaş jî nebim heger bibêjim sîstema hiziriya Qoçanî her di vî dîwanî de heta ***"ew xewna li ser fîstanê wê bûm zava"*** heman sîstem û serederîkirine digel herdû babetên nîştimanî û sozdariyê, di pertûka navbirî ku li sala 2001-ê hatiye çapkirin dibêje:

"Bo milletê min, yara min, welatê min û ew dewleta hêşta nebû ev hozane diyarîne"

Aneku (diyarî) verêja heman sîstemê hizirî û dîtiniye, bi baweriya min di helbestan jî de, dîsan herdû tewerên nîştimanî û sozdarî dûbare dibine ve, carina (dewlet) dibe ruha rehaya nîştimanî û carina eşq jî dibe ew êtîna di nav xwîna Mihsnî de bişkiftî û natemire. Renge Muhsin ji layê şêwazî û zimanî guhurîn û pêşdaçûn dîtibe, lê ji layê desthelata mana û helbest wek verêjek bo sîstema hizirî, guhurînên mezin û diyar bi xwe nedîtîne, helbestên Qoçanî, manayên diyar û aşkira yên xwe hene, Muhsin Qoçan di hozana ***"Sivik were"*** ku li ***"Befra li vêrê"*** belav bûye dibêje:

"Ho periyê..
Cêmka çavêt hêvî yê
barê xemêt xwe tu dane
Sivik were.
Sîngê min bo te zozane..
Têr lê bigere
Lêvêt min ji te re çerwane."

Û li sala 1999-ê Qoçan dibêje:

"Li van nêzîka
Min li bere
Diyariyekê bo te bînim
Ji bişava bajêrvanî yê

Ji keşeperên belatînka
Ji yarîkên gul û xunava
Qafkekê ciwan
Weku semfoniya keniya te
Lê li cih gulê
Dê çavên xwe têdaçînim"

Û dîsan Muhsin di helbesteka dî ya li sala 2003-yê de dibêje:

"Bibe gezo û bi lêvên min de were xarê"

Ev nimûne min gelek bi lez di nav sê pertûkên Qoçanî hînane der ku jiyê wan di navbera salên 1986 û 2003-yê de ye, em bi sanehî hest pê dikin, ku her sê verêjê heman sîstemên hizirîne û tinê pêşdaçûn ji layê zimanî ve hatiye rûdan, heger na, wate heman amajên wekhev didine me.
Min divê bibêjim, helbestên Qoçanî ku helbestên baş in û Muhsin wek helbestvan şiyaye berdewam binivîse û berhemên xwe çap bike, lê li ser yek binema asê maye û heta niho jî bi heman sîstem helbestên xwe yên kevin nû dike ve, aneku pirosa nivîsînê li dev Muhsinî helbestek berdewame. Lê bi nefesek kurt, heger na, ez bawerim bi karê montajkirin û têkhelkêşana dîwanên wî yên mişe em dişên helbestên dirêj û xwedan henaseka nevebir jê çêkin.
Û renge di dawiya helbestên Qoçanî ku ***"Xidiro"*** bû li 2005-ê hatiye nivîsîn û li kovara Peyv hijmar 32 hatiye belavkirin, verêja heman sîstema siyasî ye.
Lê renge ta radekî bişê wek mirovdostek, xwe bidet niyasîn û rexnê li desthelata aqilmendên kurdan bigirît, û cîhanbîniyekê bo dîn û duniya û dînatî û siyaset û desthelatê pêşber bike, lê dîsan jî helbest nigûye, dimana û amajên diyar û aşikira ku delîfê nadet me, em têda bi desthelatên xweyên zimanî û xwandinê bigeryên, renge ew sîstem heman sîstema salên heftiyan be, demê helbest çekek bû didestê mirovîda da di jî desthelata dikitatoran rawesitît, û vêgavê jî nêzîke heman tişt lidef Muhsinî û komeka helbestvanên deverê û kurdan dûbare bibe, ew jî ji ber egera guhurînên siyasî ku pişti serhildanê bi şerên xweku jî dest pêkir û paşî jî şerê azadiya êêraqê û xewna dewletbûn û serxwebûnê ji êêraqê li cem me.
Diyar e ew rûdawên siyasyên mezin, karîgeryê li helbestê diken, lê wekî ez têbînî dikem heçeku, wan helbestvanan divêt careka dî li cemawerî bizifirin, piştî ku mawekê gaziya hozana nû û nûxwazyê

dikirin.

Selman Kovilî:

Mamê rehmetî Selman Kovlî, ku li cem min cihek taybet heye, dîsa ew jî yek ji wan dengaye ku digel Qoçanî şiyayene karîgeriyê di helbesta nû de bikin û wek gazîkerek nûxwaz hatiye niyasîn, renge baş be heger em berperê dawiyê ji dîwana wî ***"Cîhana guha"*** bixwînîn demê dibêje:

"Silav li qelemên xweragir, li helbestvanên kepî bilind, ewê ji berî û pişti serhildanê stirî û di çavên dijmin û neheza re, di çavên birakuj û deholqutên birakujiyê û dûberekiyê re. Ji wan re û bo hemû dilsoz û wefadar û xwedan helwîsta ev dîwane diyarî ye."

Renge di vî diyariyê de em verêja hizra mamosta Selman Kovilî bigehîn ku sîstemek nîştimanperwerî û kurdperwerî ye.

Diyare ***"Werine vînê"*** gaziyek diyar û aşkiraye, bo ku mirov bihê vînê û jînê û diyare jî helwîst û wefa û dilsozî jî dîsan ew babetin ewên Mamê Selman gaziyan bo dike û helbestên wî tijî wan raman û amajanin.

Çi dîwana ***"Cîhana guhan"*** û ji ***"Demê çargoşe"*** herdû berhem tijî wateyên siyasî, civakî û kurdayetîne:



"Sosyalîzm
Ev baxê gulane
Ezê di nav de
Tu yê ji dûr ve dibînî
Ez û gul himbêzîn
Tu yê di xewnên xwe de diçînî
Tu alozî
Welê ez dê li çi alozim
Komonîstim
Û bi jî sosyalîzm."

Eve yeke ji helbestên mamosta Selman Kovlî ku li sala 1997-ê hatiye nivêsîn, ku tê de helbest nêzîkî

dirûşman bûye.
Her wesa di piraniya helbestên rehmetî Selman Kovlî, em bersivên yeqînî dibînîn, bo nimûne dibêje:

"Were di vî jûra tarî ve
Li nav kel û pela bigeryê
Li min bigeryê"

Diyare em dişên pitir ji ravekî bo wan peyvên serî bikin, bo nimune bibêjin, merema Selman Kovilî ewe bibêje mirov jî weku kelupelan lêhatî, aneku mirov jî bûye kelupel û dihê kirîn û firotin, yan mirov ji mirovayetî vala bûye û çi bihayên remzî û ruhî nemayine û bi tinê bihayeka madî ye, wek her kelupelek din, û dîsan dişên gelek ravan bidine tariyatiyê û her wesa daxwaza lêgeryanê jî bikine babetek felsefî, yan mirovayetî, yan siyasî, yan civakî.
Lê eve hemû di dumahiyê de dibine bersivên yeqînî bo pirsên Mamê Selman Kovilî. Dîsan ez dibînim di helbestên Mamê Selman jî de ziman sadeye û helbest sadene û mirov bi sanehî têdigehê. Aneku heger me pirsek jî hebe, eve Mamê Selman bersivekî dide me. Nihêniyên xwe keşif dike û sihirên xwe vala dike, mereqan nahêle di dilê me de.
Dîsan di navbera ezmûnên Mamê Selman bi taybetî ***"Cîhana guhan"*** û ***"Demê çargoşe"***, cewaziyên mezin nînin û em neşên herdû berheman wek dû berhemên cuda bixwînîn. Belkî pitir timamkera hevdûne û renge heman şêwe, reng û deng û henasen. Min nevê bibêjim Mamê Selman dengekê tureye, yan rengekê tox yan wêneyê şorşgêrekê siyasî, yan civakî heye. Heger çî dişên wan raveyan di helbestên wî de bi sanehî destnîşan bikin, çunke demê em destnîşan bikin bi ankoya vê çendê dihê ku me ew mana destnîşan kir ewa verêjên sîstema hiziriya Mamê min Selman Kovilî ye.
Renge Mamê Selman yek ji wan helbestvanan be ku remiz û hêma bi zîrekî û ciwanî di helbestên xwe de bikarhînabin, û renge gehiştibine rada huneriyê, aneku bikarhînana remzan li cem Mamê Selman heman erkê rimzên Bedirxan Sindî û yan Muweyed Teybî, yan helbestvanên heftiyan û heştiyan bi cih nahîne, renge yên wan rimuzên neçariyê bin, ku zerureta barê siyasî û rewşa civakî xwastibe. Lê ya Mamê Selman karek hunerî bin, lê digel vê çendê jî demê em wan remzan rave dikin, dîsan dê tûşî heman arîşa desthelatên mana û erkên siyasî û civakiya helbestê bîn.
Divêreda bo bîrhanîn başe bibêjim: Heger despêk mirov li cem

klasîkiyan remiz bû bo xwedê paşî li cem nivîserên şêstan û heftiyan û heştiyan remiz bû bo welat û nîştmanî, û paşî lisalên heştiyan pîç pîçe û nohetan digel hindek dengan wek Muhsin Qoçan û Xazî Akreyî û yên din bûye rimzên sozdariya mirovan û digel hev di kiryara eşqê de, û li cem Mamê Selmanî û paşî dêbînîn li cem helbestvanên dî jî mirov dibe remiz bo dû babetan yekem desthelat û duwem bê desthelat, aneku mirovên xwedan desthelat, axa û beg û karbidestên piştî serhildanê û benî û gundî û mîllet û xwedanên şehîd û karesatan, bi taybetî di berhemên piştî serhildanê û şerê nafixweyî.
Ku Mamê Selman Kovlî jî yek bû ji wan helbestvanan ku ev milmilane di çendîn berheman de diyar kirîne:

"Her çil sala,
Xidir têt û dibe mêvan
Spêdê em tûla berdidinê û
Raditeqînîn..
Paş çil sala têt bîra me
Ji nû bo digirîn
Ji nû çîroka wî vedigêrîn
Şefbêryêt xwe pê diqedînîn
Her careka hatî û revî
Gotineka wî ya deng veday
Kurd xayîno..
Her şeveka çîroka wî
me vegêray..
Me ya gotî Kurd xayîno
Her şivanê marî gestî
Ya qêrkirî Kurd xayîno

Kurd xayîno, eve wêneya giştiya mirovê kurd e ku di barekê siyasî, civakî û mêjûyî de dibe xayîn û xwefiroş û şerker sera desthelat û deskeftên madî.
Diyar e hewlên Mamê Selman ew bû ku helbest bibe rêgirek li ber dem şer û xwekuştina mirovê kurd bi destê kurdan, aneku helbest bişê rastewxwe bibe ziman û dengek dijî şer û venabûnê û manayeka jiyandostiyê di nav bizava siyasî û civakî û mêjûyî de xeliq bike, bi vê çendê jî helbest tijî siyaset û mêjû û civak bû.